EM.. ZAROKÊN ME Û KULTURÊ ME LI DERVEYE WELATÎ

Dewlet Elî

Her gelekî li ser rûyê erdî rewişt û tîtalêt xwe yên taybet hene, ew in nîşana wî û bi wan ji miletên dî tête cudakirin. Em jî wek gel, xwedî rewişt û kulturek buhagiran în. Pêdviye em di hişyar û rijd bîn li ser hindê ku nifş bo nifşî biparêzîn û nehêlîn di nav gêleşoka jiyanê da winda bibît. Niha pirs ew e ka dê em noke çawa û bi çi reng vî tiştî di zarokên xwe da çînîn, da ku bihête parastin. Ev parastine heta radekî ya bi sanahî bû, heta ku ger gehiştî nifşê me, çi bi razîbûn ba, çi jî bi zorlêkirin ba. Her çawa ba diviya zarok li ser hatiba taşandin û gelek cara, xeletiyên mezin rûdidan ji ber zordariyê û pir givaştinê û verêja vê çendê dibû, kesatiyeka comples û pir alozî, êş û nesaxî. Ji ber ku bi hinek rêka dihatine taşandin, bo diyarkirina van rêka, me ev her du nimûnên xarê wergirtin:

1. Kurê min/ kiça min gelek yê/ ya aqil e, guhdar e, zîrek e, serê xwe ji ber mezina nahilîne, di ber mezina ra naaxve, mîha Xwedê ye û…htd. Heta ku hêdî hêdî û di nefsa xwe da dibû mîha Xwedê û bi wî qalibî derdikevt ewê dayîk û baba diviya, ev zarokê bi vî rengî dihate taşandin, dema mezin dibû jî, her li ser wî destûdarî dima, ne caba kesê dida, ne berevanyî ji xwe dikir, bila çend hatiba xapandin, an çend heqê wî hatiba xwarin û hosa dibû xwedan kesatiyeka neliv, guhdar, bixweşerm, şkestî, bindest. dibe di karê xwe da yê serkeftî be û gehiştbe peyiskên bilind, lê her yê mînakî bûye û her kesekî bi wî çavî berê xwe didayê.

2. Tu mirovekê pûçî, bikêrnahêy, te çi rê bo xwe negirtîne û nabiye çû, tu kiçeka bê me'zî, behîma Xwedê yî, çi bi guhên te da naçît û...hd ji van sîfetêt ne ciwan yêt ku nefs pê tête kuştin û herişandin. Gotina van peyva bisanahiye û dibe dilê hinek dayîk û baba hûn bike, lê pa heger em hizra xwe tê da bikîn, ji nûka dê zanîn ka karê wan li ser zarokî wek kesekê nazik çende û çend ji dil û giyanê wî diçirmisîne, belê pa em evê nizanîn û me hizra xwe tê da nekiriye ku ev peyve roj bi roj cihê xwe di mejiyê zarokî da diken, êdî bawerî bi xwe namîne, ne di karî da, ne jî di helbijartina hevalan da, ne jî dikare têkeliyê di gel zarokan da bike, ji ber ku hestek bi kêmatiyê li cem peyda bûye û li vêrê, an dê kasatiyeka hejhejok û lawaz, tirsonek, veder ji civaka zaroka, hebe û eve dê di jiyana wî ya paşerojê da, arîşa bo peydake. Li vêrê her tiştê dayîk û bab û civak dibêjîtê dê li cem kopî be, belê pa her di wî demî da, ew jî dê bîte kopiyek ji bab û bapîran, bêyî ku kasatiyeka taybet hebe. An jî dê be di karê xwe da, yê serkeftî be, neguhdar, xwedan kesatiyeka mukum û zordar, her karekê pê radbe ne xem e bo wî, ji ber ku ev nave yê hatiye ser û cihê gengeşê li cem kesê nedîtiye ku bo

bizane ka li ser çi bingeh bi vî çavî lê dinêrin, çi harîkarî ji layê kesê ve nedîtiye ku xeletyên wî bihêne dirustkirin, belkî her dem yê qutay û vequtay bûye, sera her xeletiyekê û êdî dema ketiba tengaviyekê, ji tirsê neşiyaye hewara xwe bigehîne kesekî, di rewşeka hosa da dibe ew dê pê li hemî kultur û edeta ke û li vêrê bila em gunehê ne êxîne stûyê zarokekî dema digehîte paşerojeka reş, li demê ku me dikarî bikîne kesekê dî, eger em pîçek ji peyîskên xwe yên bilind xarkeftibayn û hatibayne rêza wî. Û li vêrê divê em bîra xwe ji gotina mezina bînîn "çi diçînî wî dihelînî."

Her çende gelek ji me xwe bi zana û rewşenbîr dizanin, lê pa heta niha em bi ziman û selîqa bab û kalên xwe diaxivîn û qewana wan vedgêrîn. Kî ji me rojekê ji roja rûnştiye dîwana zarokên xwe û pîçek ji wextê xwe yê bihagiran dayê.? Kê ji me ji xwe girtiye wek heval dan û standinê di gel zarokên xwe bike û êmnahiyekê bo peydake da ku dema tengaviyê bê tirs qest bike me û dilê xwe bo me veke?. Ez nabêjim divê em zarokên xwe berdîn û dest ji kultor û edetên xwe bişûyn, nexêr; em civakekîn xwedan xizîneka bihagiran ji kulturekê ciwan. Heger me tirsek li ser kulturê xwe hebe û me bivê biparêzîn, berî her tiştekî divê em bizanîn ku vêre civakeke, erd û esmana ji civaka me cuda ye, zarokê me evro yê di vê civakê da dijît, nabêjim baştir e, ji ber ku gelek tişt tê da hene di gel me û civaka me nagoncin, her wesa nabêjim xirab e, ji ber gelek tişên baş tê da hene. Bo me nabe em hukmî danîn. Berî her tiştî divê em tiraziyê dirust bikîn ka çi beranberî çi têt, da ku heqê kesê nehête xarin. Li vêrê divê em xwe û dewrê xwe (zemanê em tê da jiyayn) danîne rexekê tiraziyê û li rexê dî kultorê wî dewrî, paşî teraziyê vala kîn û van zaroka û vî dewrî danîn beranber her wan rewişt û edetan. Belê li dewrekê dî, ne cih, ne zeman, wek hev. Bêguman cudahî dê ya mezin bîe û divê em bi şehrezayî tirazyê dirust bikîn, ku ne kulturê me yê bihagiran ji destê me biçe, ne jî zarokên me û li vêrê xusaretî hizar carkî ye. Ev dirustkirne dibe bi dev ya bi sanahî be, belê pa piraktîka wê ya bi zehmet e, ji ber ku zarok li vêrê ne wek yê welatî ye. Her çende li vêrê û li welatî jî sê cihên cuda kartêkirina xwe li ser jiyan û kesatiya wî diken ew jî:

1. Mal 2. Xandingeh 3. Civak

Lê li welatî, her sê wek hev in, çi cudahiya wesa di navbera wan da nîne, hemî yê bi êk reng û terz û ta rabûyn û hatî ne taşandin, hosa zarok dibe kopiyek ji dayîk û baba û civakê.

Li Eurupa mala kurd her ew e, ewa li welatî, lê xandingeh û civak 100% cuda ye. Li vêre zarokî perwerde dikin li ser:

1. Serbixweya kasatiyê û hizr û bîra.
2. Baweryê, bi xwe.
3. Guhdariya kure û bindestiyê qebûl nakin.
4. Gengeşê û li dûfçûnê, zanîna tişta li ser bingehê têgehiştinê.

Zarok şehrezan e, divê em di hişyarbîn di bersiv û rabûn û rûnstinên xwe da, bersivên nîv nîve wan razî nakin, gelek caran û ji ber ku tiştê em bo wan dibêjîn gelek yê dûr e ji wê ewê em dikin, bi xwe bi aqilê me dikenin, em dişên bêjîn li gor aqilê me diçin, lê pa neşên çi bêjin, hinek caran jî dibêjin û eve cihê tirsê ye, ji ber ku bi çavekê dî li me dinêrin. Deyîk û bab senbolekê mezin e, wek şiyaye bo wî, bingehê avakirina kesatiya wî ye. Divê em wan sembol û nimûnên wî bo xwe avakirin neherêfîn.